Folk–
bildnings
–rådet

Mafên te li xwendingeha bilind ya gelî [folkhögskolayê]

Tu li xwendingeha bilind ya gelî dixwînî? Ma tu ji rewşa xwe nerazî yî yan tu û xwendingeh li hev nakin? Heger wisa be, tu dikarî têkilîyê bi Desteya mafên xwendekaran ya xwendingehên bilind yên gelî bikî. Em dikarin alîkarîyê bikin û şîretan bidin û agahdarîyan derbarê mafên te bidin.

Ji xeyrî hin qaîdeyên mişterek, xwendingeha bilind ya gelî azad e

Xwendingeha bilind ya gelî awayekê perwerdeyê ye ku bi hedefên berfireh tê bi rê ve birin û qaîdeyên mişterek yên kêm jê re hene. Desteya xwendina gelî alîkarîya dewletê ya ku pê xwendingehên bilind yên gelî karê xwe bi rê ve dibin parve dike. Hin qaîde ku girêdayî alîkarîyan in hene, lê saxtîkirin û kontrolkirina xwendingehan ne wezfîeya Desteya xwendina gelî ye. Qanûna dibistanan li ser xwendingehên bilind yên gelî tedbîq nabe û ji bo wan xwendingehan planên hînkirinê yên dewletê tune ne.

Ji bo te yê ku li xwendingeha bilind ya gelî dixwînî tê wê maneyê ku komîteya xwendingehê ye ya ku piranîya biryaran yên ku tesîrê li rewşa te û mafên te li xwendingehê dikin dide.

Desteya mafên xwendekaran ya xwendingehên bilind yên gelî[Folkhögskolornas studeranderättsliga råd, FSR] heye ji bo ku pêgeha hiqûqî ya hemû xwendekarên xwendingeha bilind ya gelî xurt bike.

Nerazî yî? Hûn li hev nakin? Weha bike!

Ma tu ji rewşa xwe nerazî yî yan tu û xwendingeh li hev nakin? Tiştê herî pêşîyê ku tu bikî, here ba birêveberê xwendingehê. Heger tu piştî behskirina pirsgirêkê ji birêverberî re nerazî bî, tu dê meseleya xwe bigehînî komîteya xwendingehê. Gava ew helwêsta xwe derbarê pirsigrêkê diyar dikin lê tu hêj nerazî bî, tu dikarî meseleya xwe bigehînî FSRê.

Tu dikarî kîjan pirsgirêkan gilî bikî?

Ev mînakek e ji bo pirsgirêkên ku tu dikarî bigehînî FSRê:

- kursa te ne li gor wê astê ye ya ku xwendigehê soz kiribû
- xwendingehê agahdarîyên şaş derbarê mesrefên lazim dane
- tunebûna tesîra beşdaran û mafê xwendekaran
- rutînên xwendingehê ji bo şopandina netîceyên xwendinê û kêmasîyên hazirbûnê
- kursek îptal dibe yan tê paşde xistin
- tedbîrên întîzamê (wek derxistin yan cudakirin)

Tu nikarî netîceyên xwendinê yên tesbîtkirî li ba FSRê yan li ba cihekê din yê derveyî xwendingehê gilî bikî.

Îmkana gilîkirina meseleyekê li ba FSRê tenê ji bo te dibe yê ku kursekê ku mideta wê ji 15 rojan dirêjtir e dixwîne. Divê gilîkirin herî dereng salekê piştî ku te xwendingeh terk kiriye bigehije FSRê.

Piştî gilîkirinê çi dibe?

Komîteya xwendingeha bilind ya gelî ji karê xwendingehê berpirsiyar e û biryarê dide ka kîjan qaîde dê bên bi kar anîn. Lewra, gava em - FSR - meseleyekê dinirxînin, em qaîde û şertên xwendingeha bilind ya gelî ji bo xwe dikin bingeh.

FSR qet nikare biryara xwendingehê biguhore, lê em tewsiyeyan didin xwendingehê. Heta niha piranîya xwendingehan yên ku hatine gilî kirin tewsiyeyên FSRê bi cih anîne.

Tu dixwazî dîtinên FSRê derbarê meseleyên cuda bizanî? Zêdetir li vê derê bixwîne

www.folkbildningsradet.se/fsr

Têkilîyê bi me bike:

Miamelekarê FSRê: 08-412 48 10

Sentrala Desteya xwendina gelî: 08-412 48 00

fsr@folkbildningsradet.se